Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1086 | 30-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Her xwarineke li Kurdistanê xwedî çîrokekê ye


**Şehrîban Matyar û Şîmel Beyîk tehm û xwarinên herêmî yên li Kurdistanê lêkolîn kirin û pêşkêşî Amediyan kirin. Diyar kirin ku her xwarinek xwedî çîrokekê ye.**

Her herêmek xwedî taybetmendiyên xweser ên dîrokî û çandî ye. Yek ji van jî çanda xwarinê ye. Her xwarina li Amed, Serhed, Xerzan û Botanê xwedî çîrokekê ye, yan jî xwedî bingeheke ji tehma wê herêmê ye.

Şehrîban Matyar û Şîmel Beyîk li Amedê ji xwe re cihek amade kirine û xwarina herêmî ya li Kurdistanê pêşkêşî xelkê bajêr dikin. Matyar û Şîmel her wiha tehmên nû jî diafirînin û tevkariyê li çanda Kurd dikin.

Matyar bal kişand ser bandora pincara li ser xwarinê û got, "Li Colemêrgê pincarê ku havînê li zozanan têne komkirin, tên ziwakirin û zivistanê tevlî xwarinê têne kirin. Li Şemzînanê tiştekî bi navê 'Şûrexwirî' heye, giha û pincar tevlî hevîrê xwe dikin û bi wî rengî xwarinê çêdikin. Pincarê li Amedê û yê li wir ne weke hev in; lewma hem tehm hem jî navê xwe cuda ne. Di destê wan de çi hebe, li gorî wê xwarin çêkirine. Ev yek ji bo her herêmê derbas dibe. Li gorî sosyolojî û cografya Botan, Serhed û Amedê tehm jî cuda ye."

### Xwarina her herêmekê





Matyar li gorî derfetên xwe li bajar û bejahiya Kurdistanê digere, pincaran kom dike û xwarinê jê çêdike.

### Xwarınên ji bo têrkirinê

Matyar anî ziman ku gelek celebên xwarinê li gorî herêmê nav guhertiye û got, "Xwarina Nîsk ji ber ku bi Zazakî jê re hebenîsk tê gotin, navê xwe bi wî rengî maye. Yan jî dema çûm Colemêrgê ji bo lêkolînê li ser tehma herêmê bikim, min dît ku xwarin bi giranî ji mast û goşt tê çêkirin. Lewma ji xwarinên ku bi mast têne çêkirin re dibêjin 'Masteva'. Li Colemêrgê her wiha şîraniyek bi navê 'Lalepet' heye. Ev şîrînahî berê ji bo şivanan dihate çêkirin, ji bo ku li çiyê, di dema çêrandina heywanan de wî têr bihêle. Lê niha êdî bûye tehmeke herêmî. Wekî din li Farqînê xwarinek bi navê 'Cimîlîk' heye. Ew jî mîna lalepet, ji bo mirovan têr bike dihate çêkirin. Ji dims, rûnê nivişk û qeliyê tê çêkirin. Mirovê ku vê xwarinê bixwe heta êvarê têr e. Ji ber ku xwarineke giran e."

### Tehma ku li gorî cografyayê diguhere

Şîmel Beyîk jî diyar kir ku xelkê Amedê bi giranî ji xwarina bi goşt hez dike, lewma di her xwarinê de goşt heye. Beyîk got, "Ji bo mirovên vejeteryan û vegan jî em xwarinê çêdikin. Xwarinên me yên bi zeytê jî hene, yên bi rûnê berberojk jî hene. Em ne tenê xwarinên ji herêma Amedê pêşkêş dikin, her wiha xwarinên ji her herêmê çêdikin. Xwarinên ji herêmên Serhed, Başûrê Kurdistanê û herêmên din çêdikin. Berê ji ber ku mirov hînî xwarina li lokanta û derve nebû, haya xwe zêde ji tehmên cuda tune bû. Lê belê niha li Amedê mirovên ji her derê hene. Hem ji ber koçberiyê, hem ji ber karmendiyê hem jî xwendinê, mirov hene. Lewma divê em li gorî tehma devê wan xwarinê çêbikin."

Beyîk anî ziman ku xwarin li gorî herêman cuda ne û got, "Em carna li girseyeke welê rast tên ku tehm û xwarinên cuda dixwaze. Amedî di vê mijarê de kevneşop e, xwarinên cuda zêde tehm nakin. Lê belê hinek tên dixwazin yên nû tehm bikin. Ji bo wan jî heta ku ji destê me tê em lêkolînê dikin, tehm û xwarinên nû çêdikin."

# Libê zîpikê bi qasî gogê

**Germa zêde ya li başûrê Ewrûpayê ecêb jî kirin. Piştî germeke zêde û rewayeke giran, li Îtalyayê zîpik bariya. Lê libên vê zîpikê biqasî gogeke tenîsê bûn û ji ber wê 110 kes birîndar bûn. Wêneyekî ji herêma Venetoyê nîşan dida ku libeke zîpikê ji gogeke tenîsê jî mezintir e.**

Yanî tevî ku ev bû du sed sal pêlên germa zêde Îtalyayê didin ber xwe, lê li bakurê welêt ew qasî zêde tesîr nedikirin. Vê carê li bakurê welêt tesîr kirin û hema piştî pêleke germê jî bi taviyan re zîpik bariya û zerareke mezin da bakurê Îtalyayê.



Rayedarên herêma Venetoyê da zanîn ku hêzên hewarê lazim bû bi sedê caran biçin bi hewara xelkê ve. Di nava demeke kurt de 500 kesî hewara xwe gihandibû wan.

Sudoku: Bersiv 95

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 3 | 7 | 5 | 4 | 8 | 9 | 1 | 2 |
| 8 | 5 | 9 | 2 | 7 | 1 | 4 | 3 | 6 |
| 2 | 1 | 4 | 3 | 9 | 6 | 7 | 8 | 5 |
| 1 | 7 | 5 | 4 | 6 | 9 | 8 | 2 | 3 |
| 3 | 9 | 8 | 7 | 5 | 2 | 1 | 6 | 4 |
| 4 | 2 | 6 | 8 | 1 | 3 | 5 | 7 | 9 |
| 5 | 8 | 1 | 6 | 3 | 4 | 2 | 9 | 7 |
| 7 | 6 | 2 | 9 | 8 | 5 | 3 | 4 | 1 |
| 9 | 4 | 3 | 1 | 2 | 7 | 6 | 5 | 8 |

Sudoku:Pirs 96

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | 7 | 8 | 4 | 5 |
| | | | | | | | 3 | |
| | 8 | | | | | 1 | | 9 |
| 6 | | | | 3 | | 4 | | |
| 7 | 5 | | 4 | | 9 | | 1 | 2 |
| | | 8 | | 2 | | | | 3 |
| 3 | | 9 | | | | | 2 | |
| | 4 | | | | | | | |
| 5 | 6 | 2 | 1 | | | | | 7 |

# FERHENGA BIWÊJAN

## çend agahî li ser pirtûkê

Bêguman her biwêj bingehekî wê, çîrokeke wê heye, lê mixabin çîrokên tevan nayên zanîn. Yên ku çîrokên wan tên zanîn, di dawiya pirtûkê de hatine dayîn. Agahiyeke din; hin biwêj bi çend qalib, yan devokan tên gotin, min hewl daye tevan bidim. Weke din min biwêjên derbarê her mijarê de di binê sernavekî de kom kirine.

Çavkaniyên min sûd ji wan girtî: Pirtûka Amed Tigrîs ya bi navê Gotinên Pêşiyan, pirtûka Mele Mehmûdê Dêrşewî ya bi navê Miştaxa Çiya, pirtûka Mustafa Borak ya bi navê Ferhenga Biwêjan û pirtûka Sadiq Bahaeddîn. Lê bi giranî min ji nava civakê kom kirine.

**LI SER KEDA DEST**

**Aboriya wî destê wî ye:**
- Bi keda destê xwe dijî.

**Bi meqesa xwe bibire, bi derziya xwe bidirû:**
- Karê xwe bi destê xwe bike.

**Ga ket poçik li xwedî:**
- Bi heman wateyê.

**Heçî li hespê hevalan siwar e, her peya ye:**
- Bi heman wateyê.

**Ji gur re gotin; çima stûyê te stûr e, got; ez bi destê xwe dikim, bi devê xwe dixwim:**
- Ez keda destê xwe dixwim ji ber wê rewşa min baş e.

**Ker bikeve ji xwedî zeximtir nîne:**
- Ti kes bi qasî mirov xwe di ber karê mirov de naêşîne.

**Ker ket heriyê xwedî girt teriyê:**
- Bi heman wateyê.

**Mirov bi destê xwe pişta xwe nexwerîne xwera mirov naşke:**
- Divê mirov bi destê xwe ji xwe re bike.

**Reşo, tu û destê xwe, nexwe avê tu birî:**
- Tişta ku mirov bi destê xwe bike ew ji mirov re dimîne; ku mirov bi destê xwe pirsgirêkên xwe çareser neke ti kes çareser nake.

**Siwarê hespê xelkê her peya ye:**
- Mirov ji kîsî xelkê dewlemend nabe; rewşa mirov bi alîkariyê baş nabe.

**Yê mayî li hêviya yaran maye bêwaris:**
- Yê karê xwe bi hêviya kesin din ve bihêle wê karê wî wisa bimîne.

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1086 | 30-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# PDK'Ê DI PIŞTA KURDAN DE XENCEREK E

PDK'ê di xizmeta berjewendiyên dewleta Tirk a dagirker de ti sînoran nas nake û di dijminatiya li dijî Kurdan de jî bûye hevkarê dijminê gelê xwe. Endamê Meclisa Giştî ya PYD'ê Eseed Menan diyar kir ku careke din bi temsîlkirina xeta xiyanetê, PDK û dûvikê wê ENKS'ê di bin navê alîkariyên mirovî de saziyên xwe li Efrînê vedikin û armanca wan ya sereke jî rewakirin dagirkeriyê ye.**R-3**




## Zîn Henan: Parastina Nirxên Şoreşê Erka Ciwanan e



Ciwanên rêxistinkirî bingeha avakirina civakeke exlaqî û polîtîk in, bi van gotinan endama Koordînasyona Tevgera Ciwanên Şoreşger ya EFrîn û Şehbayê Zîn Henen behsa girîngiya rola ciwanan di şoreşê de kir, her wiha anî ziman ku ciwanên Apoyî mîrasê tevgera azadiyê ne.**R-6**

## Nameya Demokratîkirina Rojhilata Navîn bi hev re serbixin

Di sala 2015'an de, Kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk, gelek kar û xebat, bi armanca çareserkirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn da meşandin. Herwiha hewildanên çaresriyê ji Rojhilata Navîn re berdewame.**R-7**



## 11 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin

HPG'ê ragehand ku di çalakiyên gerîla de 11 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin û 3 dagirker jî birîndar bûn, herwiha kamereyeke mobesse û konek hatin îmhakirin û derb li konekî hate xistin.**R-3**




## Zanista Şoreşa Jinê Jineolojî




Jineolojî bingeha yekemîn a tekoşîna jinên Kurdistanê û fikir û nêrînên Rêber Apo li ser mijara azadiya jinê ye. Heman demê de ji ber ku herem û cihê ku şoreşa jinê ya yekemîn pêk hatiyê, civaka ku hîn van nirxan diparêze lekolîn û zanebûna xwe li ser van nirxan pêş dixe.**R-2**

## Veguherîna siyaseta Tirkiyayê û bandoriyên wê



Erdogan hemû dewletan keysbaz dike da ku qaseyeke mezin a destkeftîyan ji dewletên rojavayî û Rûsiyayê di heman demê de, bi dest bixe. Rûsiya ji ber ku di şerê wê bi dewletên rojavayî re, pêdivîya wê bi Tirkiyayê heye, hinek tiştan bi dest wê ve berdide û çavekî xwe li ber siyaseta Tirkiyayê ya li dijî Rûsiyayê digire.**R-5**



Hafiz Ahmet Turhalli
**BÊBEXTIYA LOZANÊ** R-6



Idrîs Henan
**Ji Derziya Dijmin Pirtir Şûjina Xwe Bibînin!** R-5



Ahmeta Aktaş
**LOZAN û Hilwestên li himber** R-4

# Zanista Şoreşa Jinê Jineolojî

Zozan Sîma

Qasî ku pirsa çima jineolojî pewiste tê kirin, heya niha zanistê civakî çima mijara jinê nekirine rojeva xwe nayê pirsîn. Bi sedan salan zanistê civakî li ser ezmunên mêran civak tahlil kir. Dema qala civakê dikirin têkiliyên siyasî, aborî û civakî yên zilaman esas digirtin. Di qadên jiyanê de nebûna jinan, sînorên ku li hember tevlîbûna van hatina danîn ne dihatin dîtin û ev rewş bi xwezaya jinan ya kêm re dihat îzah kirin. Zanista civakî heman demê de hemû civakan jî tahlil nekirin. Tahlilên li ser civaka Ewrupa weke tahlilên hemû cihanê pêşkêş kirin. Hemû civaka Ewrupa jî esas nehat girtin hinek welat û hinek çîn hatin tahlil kirin. Ji ber vê sedemê jî zanistê civakî pênase û analîzên xwe de ketin gelek şaştiyan. Dema pênase û analîz şaş bin çareserî jî çênabin. Piştî şerê cîhanê yê duyemîn rexneyên li ser rêbazên zanistî ya Ewrupa zêde bûn. Gelên bindest, herêmên dervayî Ewrupa û jinên tekoşînvan rexneyên dijwar li hember anîn ziman.




Jineolojî jî yek ji van hewldanane ku di zanistên civakî de guherînan çêbike. Tehlîlên Rêber Apo û 40 sal tecrubeya tevgera jinên azad yên Kurdistanê bi rêbazên xwe




yên analîz kirinê, tesbîtên xwe li ser pirsgirêkan û rêbazên xwe yên çareserkirinê ev şênber kirin. Jineolojî kombûna van ezmûnên ku di bin şert û mercên gelek giran yên şer û tekoşînê de ava bû. Ji ber vê sedemê jineolojî bingeha yekemîn a tekoşîna jinên Kurdistanê û fikir û nêrînên Rêber Apo li ser mijara azadiya jinê ye. Heman demê de ji ber ku herem û cihê ku şoreşa jinê ya yekemîn pêk hatiyê, civaka ku hîn van nirxan diparêze lekolîn û zanebûna xwe li ser van nirxan pêş dixe. Ev jî bingeha jineolojî ya duyemîn e. Ya sêyemîn jî ezmûnên jinên cîhanê ya tekoşîn, fikir û çalakiyêne.

Xebatên ekadamiya jineolojî ya destpêkê di çarçoveya têgihiştin û danasîna Jîneolojiyê de bûn. Di vê bingehê de bi xebatên lêkolîn-lêgerînê, dayîna dersan, amedekirina materyalên dersan re danhevek hat bidestxistin. Di asta duyemîn de xebatên avakirina komîteyên Jîneolojî, vekirina navendên lêkolînê, rêxistinkirina konferans û sempozyuman hatin pêşxistin. Danasîna Jîneolojiyê û sazîkirina vê hin jî dewam dike. Heya demekê bersiva pirsên, "Jîneolojî çiye, çi dike?" dayîn esas bû. Lê êdî jineolojî çawa bibe zanista şoreşa jinê, hevjiyana azad ava kirinê de çawa rola xwe bilîze, serxistina projeya guhertina zilam çawa pêk bîne, kirdêbuyîna jinê misogerkirinê de rêbazên çawa bikar bîne, li ser van mijaran tê sekinandin. Li hemberî êrîşên bîrdozî û fizîkî yên dijmin xwe bigihînin merheleya ku di asta têgeh, teorî û rêxistînî de bibin bersiv. Bi qasî berfirehbûnê kûrbûn, qasî danasînê pêşxistina tezên nû yê çareseriya pirsgirêkan tê rawestîn.

Bendewariyên ji xebatên Jîneolojiyê zêde ne, lê di şênberkirina ka em ê van bendewariyan çawa pêşwazî bikin de heta niha zehmetî çêbûn. Em di serdema şoreşên jinan de ne û îdîaya me ya pêşengtiya vê şoreşê heye. Ev jî pêwîstiyê çêdike ku di nav şoreşê de saziyên jin wekî biryargehên şoreşgerî kar bikin. Ji bo ku di vê astê de bi lez tevbigerin, di dem û cihê xwe de gav bavêjin, pêdivî bi mekanîzmayên çêker ên navendîbûna zêde û avasaziya burokratîk derbas dikin, heye. Ji ber vê sedemê di nav pergala me de jinên ku kardikin divê lênêrîna di çarçoveya Jîneolojiyê de qezenç bikin. Ji bo qezençkirina vê lênêrînê, gelek kar hatin meşandin. Lê em dibînin ku hîn ev kar têrê nake. Xebatên bîrdozî-fikrî ji bo komîteya Jîneolojiyê, xebatên perwerdeyê ji bo komîteyên perwerdeyê, pirsgirêkên civakî ji bo komîte û rêxistinên xebatên avakirinê dimeşînin bihêlin, ev li gorî şixulandina pergala konfederal nabe. Di rastiyê de em bi van ferasetan berpirsyariyên xwe yên pêşengtiyê hewaleyî cihên din dikin. Sîstema konfederal, sîstemek bi tûnî û girêbendî ye (organik). Pêwîste bi rengekî ku hev temam bikin birêve biçe. Erkên her saziyê cuda ne. Lê di zemîna tevgera me ya jinê de, bêyî ku cudahiya rêveberî û avadaniyê were kirin, berpirsyariya her jineke heye ku di Jîneolojiyê de kûr bibe, xebatên xwe bi vê perspektîfê bimeşîne.

Tişta herî bingehîn ku em wekî kûrbûna di Jîneolojiyê de behsa wê dikin di rastiyê de ew e, ku em naverokek zanistî ji bo hemû xebatên xwe bidin qezençkirin. Em di nirxandinên xwe de behsa wê dikin ku encamên xebatan, serkeftin û binkeftinên wan bi rêbaza zanistî binirxînin. Em bi agahiyên kêm, hinek caran jî bi agahiyên nerast şîroveyan dikin, ji ber vê yekê hinek caran em xwe dighînin jêderanînên (encam) xelet. Gelemperîkirina zêde yan jî sînordarkirin-kêmbûnparêzî (indirmecilik) dikare bibe sedema gelek analîz û pratîkên xelet. Di nirxandina me ya bûyeran, biryar û pratîkên me de serasertiya fikrî pirsgirêkên cidî di afirînin. Di cih û warên şoreşa jinê de li ser buyerên civakî ya ku jin ru bi ru diminîn divê nêrînên kevneperest an jî lîberal serwer nebin. Dema ku gotin û nêrînên zayendperest wekî xwezayî werin dîtin. Di vê derê de êrîşên bîrdozî û şerê taybet bi bandor dibin. Zayendperestî yek ji bîrdoziya herî bi bandor û kevnar a deshilatdariyê ye. Dema ku bi bertek û zanebûnê û tekoşînê neyê asteng kirin, li her cihê tundî, piçûk dîtin, dest dirêjî û erîşên ser jinan rewa bike. Di vê serdema ku wekî serdema enformasyon an jî zanîn-zanyariyê tên pênasekirin de, ji feqîrtiya zanînê zêdetir, di bin bombebarana zanînê de gêjbûn behsa mijarê ye. Bêqontroliyeke ku hinek caran nayê zanîn agahî ji kê re, çima û çawa hatiye ragihandin heye. Ji ber vê sedemê jî îro zanîn nabe hişmendî, agahiya dernekeтiye hişmendiyê xeletiyên cidî di afirîne, dibe sedema rizandinê.

Di nav agahiyan de cehaletê kûr hatiye afirandin. Rêbazên perwedeya jineolojî de, di navbera zanîn û jiyanê de girêdanbûn çêkirin, hêza şîrovekirinê dayîna qezenckirin esase. Yek alî fêrkirin zêdetir rêbazên bi hevre fêrbûn tên pêşxistin. Di navbera mijarên perwerde û pêwîstiyên kesên hatiye perwerdê hevsengî tê ava kirin. Pêwîste di xebatên me yên perwerdeyê de zanîn veguhere hişmendiyê, rêbaz û mijarên ku dê di navbera pirsgirêkên civakî û mufredatên me yên dersan de wekheviyekê çêbike esas werin girtin. Mînak eger agahiyên me yên derbarê azadiya jinê de veneguherin hişmendî, têkoşîn û nakokiyên zayendî, ev agahî wê rolek rizîkirinê bilîze. Eger zanîna me ya têkildarî ekolojiya çanda jiyana ekolojîk ne afirîne, eger dahurandinên me yên derbarê desthilatdariyê de kesayeta me demokratîk neke, şeklê me yê bidestxistina van agahiyan û bikaranîna wan muhtacî pirsyariyê ne. Tiştên em dixwînin, li gel tiştên em fêr bûne çavkaniya herî girîng a zanînê û tecrubeya me ya jiyanê ye. Dema me ew hêz nîşan neda ku em serkeftin, binkeftin, keyfxweşî û êşên xwe veguherînin tecrubeya jiyanê, em her tim amator dimînin, ji tecrübeyê bêpar, di nava lawazî û dubarebûnan de dijîn.

Dema bav an jî birayê li malê, patronê li cihê kar, hevjîn an jî xweşewîst bi perdeyên civaka zayendîperest xwe vedişêrin, têkoşîna şoreşgerî van perdeyan hemûyan radike. Şoreşa jinê jî têkiliyên jin û mêr bê bandorkirina zayendperestî û şêweyên têkiliyên nû avakirine. Gotin, tevger û hestên me di nav têkiliyên civakî de şekil digirin. Ger ev têkiliyên civakî de tekoşîneke azadiyê nebe kesayet, gotin û refdariya me jî bi pîvanên kevneperest an jî lîberal şikil bigire. Kar û xebatên jineolojî de, perwedeyên jineolojî de em herî zêde li ser van mijaran radiwestin. Ji ber ku serdema ku em têdene civak di bin çembera qirkirinê re derbas dibe, ji ber vê divê em pirsgirêkên civakî di bingeha dahûrandina sedemên sosyolojîk de binirxînin. Lêkolînên sosyolojîk yê civakî jî yê karê esasî yê navendên jineolojiyê. Li hember vê rewşê ku rastiya civakî evqasî bi lez guhertinan dijî de, em mecbûrin dahûrandinên xwe hîn zêdetir di bingeha sosyolojîk de bikin. Lênêrîna sosyolojîk çiye? Em ê çawa sosyolojîk binêrin? Çima divê em sosyolojîk binêrin? Encamên ku em bi awayekî sosyolojîk li bûyer û diyardeyan nenêrîn çine? Ev mijarên ku divê li ser bê rawestîn in. Nêzîkatiya Rêbertiya me ya sosyolojîk, xwe dispêre dahûrandinên ekademiya Mahsum Korkmaz a ku bîst salan têde dahûrandina şoreşgeran hate çêkirin. Rêbertiyê rastiya mêtingeriya taybet a li ser Kurdistanê li gorî rewşên hestewarî, şêweyên ramanê û teyisandinên wê yên estetîk ku di civaka Kurd de derdikevin holê nirxandiye. Rewşa mêtingeriya hîn kûrtir a di jinê de jî bi heman rêbazê dahûrandiye. Tişta ku Jîneolojiyê pêk tîne; qasî dahûrandina nasnameya jinê ya mêtingeriyê, ewqas jî dibe teoriyên têkildarî şêweyê azadkirina jinê.

Di nêzîkahiya zanistî ya girêdayî paradigmaya moderniteya demokratîk de, sedem û dîmenên bûyeran cuda dibin. Helwest û biryarên me jî cuda û çêker dibin. Tişta em jê re dibêjin paradigma di rastiyê de lênêrîn e. Dema em ji aliyekî din ve li pirsgirêka bûye koregirêk binêrin, dikarin bi amûr û rêbazên xwe, bi hêza xwe wana çareser bikin û ev gelek caran hatiye ceribandin, pêkanîn. Rastiya ku ev




demek dirêj e em wekî neketina nava paradîgmayê pênase dikin jî vê rewşê îfade dike. Di nêzîkahiya me ya hemberî xweza û mirovan de, di nirxandinên me yên têkildarî bûyer û diyardeyan de, her çiqasî gotinên me têkildarî paradigmaya moderniteya demokratîk bin jî, di pratîkê de bandorên ol, nêzîkahiyên pozîtîvîst-oryantalîst hene; ev jî xitimandinê çêdikin. Di vê noqteyê de pêwîste em di çarçoveya nûkirina nêzîkahî, pirsyarîkirin û lênêrîna xwe ya paradîgmayî de lêhûrbûna xwe kûr bikin.

Li hemberî feraseta zanînê ya qada akademîk a nava sîstemê ku ji jiyan û civakê qut bûye, me di zemînên akademîk de ferqa xwe hîn baştir dîtiye. Spartekên bîrdozî û pêwendiya ku Jîneolojiyê bi civakê re çêkiriye, baweriyê di afirîne. Potansiyela ku em dikarin lênêrîna derdikeve derveyî sînorên yekdestiyên sermayeyê bi afirînin eleqeyê çêdike. Divê em qada akademîk nekin navenda xebata xwe, lê wekî qadek têkoşînê bibînin û helwestek zelal nîşan bidin. Tenê bi rexnekirinê sînordar nemînin û li gorî tecrubeyên xwe nirxandin û vegotin bandorekê mezin çêdike û ev pêwîstiyek e. Wekî akademiya Jîneolojiyê



# Nameya Demokratîkirina Rojhilata Navîn bi hev re serbixin

**Di sala 2015'an de, Kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk, gelek kar û xebat, bi armanca çareserkirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn da meşandin. Herwiha hewildanên çaresriyê ji Rojhilata Navîn re berdewame.**

Ronaz Silêman/Qamişlo

Di sala 2005an de bi armanca nîqaşkirina pirsgirêkên Rojhilata navîn û dîtina rêyên çareseriyê û avakirina hizrên hevbeş di nava gelê Kurd û Ereb de, Kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk li Bexdadê dest bi kar û xebatên xwe kirin, çapkirina Kovarê bi rengê demsalan bû, her ji 3'ê mehan carekê tê amedekirin û çapkirin. Herwiha ji bo rexnekirina sîstema desthilatdarî û mêtingeriya Kapîtalîzmê di civaka Rojhilata Navîn de, kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk ji 2015 an ve li Rojava tê amedekirin, li welatên Îraq, Misir û Sûriyê jî tê çapkirin. Derbarê pêşketin, kar, xebat û rola kovarê de, Çavdêrê Giştî yê kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk Ziyad Mihemed ji rojnameya me re axivî.

Ziyad Mihemed diyar kir ku kovara Rojhilata Navîn xwedî dîrokekî nêzî bîst salan e, ku ev kovar li ser pêşniyar û daxwaza Rêber Apo hatiye damezrandin û wiha got: "Di Salên 2000'î de pêşinyara damezrandina kovarê hat kirin, di sala 2001'an de amedekariyên wê hatin temam kirin û yekem hejimar di Reşemiya 2002`an de li Libnanê hat çapkirin, lê ji ber hin şertên ku li pêşiya kar û xebata kovarê derketin, li Libinanê hat rawistandin, piştire li bajarê Mûsilê hejmara 2'an hat destpêkirin, li wir jî hejmarek tenê derket û hat



rawestandin, piştre di konfiransa Ragihandinê ya di sala 2005 an de hatî li darxistin de, careke din biryara vekirina kovarê hat dayîn. Ji sala 2005'an de bingeha kovarê bê navber dest bi kar û xebata kovarê kir. Di 2005`an de bi nave Kovara Rojhilata Navîn A Demokratîk dest bi kar hate kirin û hejmara yekê ji kovarê di Cotmeha 2005 an de, ji nû ve hat çapkirin. Li Bexdadê girêdayî saziya zanistên civakî a Abdullah Ocalan yekem hejmara kovarê hat çapkirin û belavkirin.

### Li Îraqê girtina kovarê bertekek ji Rewşenbîr û Nivîskaran re çêkir

Çavdêrê Giştî yê kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk Ziyad Mihemed di berdawamiya axaftina xwe de wiha got:"Di sala 2006'an de ji ber zextên dewleta tirk a dagirker li ser herêma Îraqê, bi sedema ku saziyek bi fikirê Rêber Apo bi awayekî fermî heye, biryara girtina wê ji dewleta Îraqê re kir. Dewleta Îraq neçar ma ku Saziya kovarê bigire, herwiha girtina kovara Rojhilata navîn a Demokratî bertekek li cem damezrînerê kovarê, Rewşenbîr û Nivîskaran, çi li Îraqê û çi li derveyî Îraqê çêkir. Tevî ku saziya zanistên civakî a Abdullah Ocalan hat girtin jî, lê kar û xebata kovarê nehate rawestandin. Ev yek nêzî salekê dewam kir, herî dawî xebatên çapkirina kovarê ji Bexdad hat Silêmaniyê li wir çapkirina kovarê berdewam kir, dema ku li Silêmaniyê kovar dihat çapkirin ji Sûriyê re jî dihat şandin. "

Ziyad Mihemed da xuyakirin ku ji sala 2015'an de kovara Rojhilata Navîn a demokratîk, li Rojava kar û xebatê çapkirina kovarê dike û got:" Kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk niha li Rojava tê amadekirin, û li welatên Îraq, Misir û Sûriyê tê çapkirin û belavkirin. Lê li ser daxwaza Rewşenbîr, Nivîskar û xwendevanan hin hejmarê kovarê car caran ji welatê derve re jî mîna Ewropa û hin welatên Araban re jî mîna Cezayêr û Lîbiya re jî hatin şandin."



### Bi hevgirtina gelan pirsgirêkên Rojhilata Navîn çareser dibin

Ziyad Mihemed axvtina xwe wiha bi dawî kir; Armanc ji avakirina kovara Rojhilata Navîn a Demokratîk, ew e, ku ev kovar bibe pirek di navbera gelên herêmê de û bi taybetî di navbera gelê Kurd û gelê Arab de. Armanc ew e, ku zihniyetekî hevbeş di nav gelên herêmê de ava bike, fikir û ramanên jiyana hevbeş û biratiya gelan çê bike, gelan nêzî hev bike, ramanên nijadperestî, desthilatdarî, newekhevî û hemû cureyên tundrewiyê rexne dike û hewl dide şoreşekî zihnî ava bike. Zemîna demokratîzekirina rojhilata navîn ava bike û got:"Armanca




bingehîn ji kovara rojhilata Navîn a Demokratîk hevgirtina gelê kurd û Ereb e. Ji bo ku pirsgirêkên Sîstema Kapîtalîzim avakiribûn tevî Sîstema nijadperest, yên ku di nava civakan de, siyaseta dijminatî û qirkirina hev ku dimeşandin, ji hizira Rojhilata Navîn rakin. Herwiha Şoreşên ku li ser rûye erdê tên çêkirin encamên şoreşên zihnîne, heger ramanên demokratîk û bi hevre wekhev û bi dadwerî jiyan kirin di hizira civaka Rojhilata Navîn de hevgirtî be, wê ev guhertin li ser rûyê erdê jî pêk bê. Daxwaza me ji hemû xwendevan û gelan ew e, ku bi hevgirtina yek hizirê pirsgirêkên Rojhilata navîn careser bikin û ji bo rojhilata navîn a demokratîk bi hevre bi xebitin."

# Xezîneya nivîs, çapemenî û weşangeriya Kurdî: Hisên Huznî Mukuryanî

Rewanduz

Beriya sed salan rewşenbîrê Kurd Hisên Huznî Mukuryanî durî berjewendiyên takekesî, tenê di xema nivîsîn, çapemenî û weşangeriya Kurdî de li ser pişta hêsitir û erebaneyê amêrek a çapê tîne li bajaroka Rewandiz bi cih dibe. Li gel Helbestvanê Kurd Pîremêrd dest bi weşandina rojname û nivîsên Kurdî dike.

Di sala 1925'an de nivîskar, rojnamevan û dîroknasê Kurd Hisên Huznî Mukuryanî ji Rojhilatê Kurdistanê li ser pişta hêstirê yekem car çapxane tîne bajaroka Rewanduz a ser bi îdareya Soran bi cih dike. Navê çapxaneya xwe jî dike 'Çapxaneya Zarê Kurmancî' Piştî salek jî govara 'Zarê Kurmancî' derdixe.

Mukuryanî navekî diyar yê cîhana nivîs, wêje û dîroka gelê Kurde. 17 salan li Rewanduzê jiyan kiriye. Heta niha jî bandora wî li ser wêje, huner û rewşenbiriya li deverê maye. Bi hatina Mukuryanî li deverê re serdemek nû ya rewşenbîriyê destpêkir. Wêjeya şer û leşkerî guherî ya wêjeya nivîsîn, huner, şano, pirtûk û xwendinê.

Di beramberî xizmeta ku vî dîroknasê Kurd ji bo bajarê Rewanduzê kirî de, Hikûmeta Herêmê di sala 2013'an de biryar da malek bi navê 'Mala Mukuryanî' li cihê niştecihbûna Mukuryanî ya li Rewanduzê ava bike. Lê deh sal borîn ne proje hatiye çêkirin nejî berê bingehîn ê projeyê maye!

Mamostayê Beşa Kurdî li Zanîngeha Soran Helmet Bayiz derbarê bandora wêjeya Mukuryanî ya li ser bajarokê Rewanduzê axivî û got:"Rewanduz û Hisên Huznî Mukuryanî ji hev nayên qutkirin. Ji ber ku bi hatina Mukuryanî ya Rewanduzê re, serdema pirtûk, rewşenbîrî, şano û hunerê destpêkir û ji berê zêdetir bipêşket. Salek piştî bicihbûna Mukuryanî ya li Rewanduzê, govara Zarî Kurmancî derket û 244 hejmar jê hatin çapkirin. Piştî wê jî pirtûkxaneya Kurdî li ser destê wî pêşket û hunera şanoyê jî serîhilda."

Helmet Bayiz destnîşankir ku bandora Mukuryanî li ser perwerde û hişyariya civakê zêde bû û wiha dom kir:"Ji bo mînak, carek kesek xelkê gundê Gerewan tê Rewanduzê û hinek tirî ji Mukuryanî re tîne. Dema ew kes vedigere, Mukuryanî hinek kovar û rojname dide wî û jê daxwaz dike wan bibe li gund belav bike, daku xelkê gund bixwênin û rewşenbîr bibin."



Di dewamê de Mamosta Helmet Bayiz da zanîn nêzî sed sal di ser nameyên Mukuryanî re derbas dibe, lê mixabin niha rojnamegeriya Kurdî di rewşek gelek xirab de ye. Bayiz got: "Mirov şerm dike rojnamevaniya niha ya Kurdî li gel yên wêdemê bîne berhev. Yên niha ne xema netewî, ne hişyariya civakê nejî mirovahî têde nayê dîtin. Silav û hurmet ji dîroknas û rojnamegerên Kurd yên binemala Bedirxanî û Hisên Huznî Mukuryanî re."

Hisên Huznî Mukuryanî di sala 1890'an de li bajarê Mihabad yê Rojhilatê Kurdistanê li taxa Hacî Hesenan ji dayîk bûye. Li Hucre û Tekyeya Xaneqan dest bi xwendin û nivîsandinê kiriye. Di temenê 21 salî de koçber dibe û li gelek welatên wek Rusya, Efganîstan, Suriye, Lubnan, Misir Hîcaz û Fransa geriyaye.

Mukuryanî li hemû Kurdistanê geriyaye û di sala 1915'an de li Helebê çapxaneyek biçûk avakiriye. Di sala 1925'an de hatiye Rewanduzê û Çapxaneya Zarî Kurmancî vekiriye. Di sala 1926'an de kovara Zarî Kurmancî derxistiye û heta sala 1943'yan li Rewanduzê maye. Piştre di 20'ê Îlona 1947'an de li Bexdayê koça dawî dike û li bajarê Hewlêrê tê spartina axê.

# Zîn Henan: Parastina Nirxên Şoreşê Erka Ciwana Ye

Ciwanên rêxiştinkirî bingeha avakirina civakeke exlaqî û polîtîk in, bi van gotinan endama Koordînasyona Tevgera Ciwanên Şoreşger ya EFrîn û Şehbayê Zîn Henen behsa girîngiya rola ciwanan di şoreşê de kir, her wiha anî ziman ku ciwanên Apoyî mîrasê tevgera azadiyê ne.

**Esma Mustefa/ Şehba**

Ciwan nûnerê hêz û îradeya civakê ne, pêşxistina ciwanan bi civakeke exlaqî û polîtîk ve pêkan e. Li ser vê esasê pêwîste bi hişmendiya Netewa Demokratîk civakeke xwedî exlaq û polîtîk bê avakirin. Ciwan nûnerê bingeh û nasnameya civakê ne, ji ber vê yekê di nava Tevgera Azadiya Kurdistanê de bi hêmanên şoreşgertî û azadiyê tên perwerdekirin. Di têgihîştina rastiya dijmin û naskirina dîroka xwe de bûne pêşeng. Li ser van bingehan di oxira azadiyê de bi bedelên gelek giran xwe kirine fedayê gel. Çawa ku tekoşîna Tevgera Azadiyê bi ciwanên Apoyî yên ku ji felsefeya Rêber Ocalan re bûn qehreman hat destpêkirin. Tevgera Ciwanên Şoreşger di şoreşa Rojava de ji avakirina komên yekemîn yên Yekîniyên Parastina Gel YPG bigire û heyanî avakirina sîstema Rêveberiya Xweser cihê xwe tê de girtin. Li ser esasê Paradîgmeya Netewa Demokratîk cihê xwe di tavahî qadên civakê de girtin bi vê mabestê ciwanên Apoyî tavahî ciwanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hembêz kirin û bo Tevgera Ciwanên Şoreşger yê Sûriyê.

Têkildarî rêxistinbûna ciwanan di şoreşa Rojava de her wiha rol û misyona ciwan û jinên ciwan di pêvajoya heyî de, endama Kordînasyona Ciwanên Şoreşger yê Efrîn û Şehba Zîn Henan ji rojnameya me re axivî.



**`Ciwanan guhartin û veguhartinên cidî avakirin`**

Zîn diyar kir ku ji destpêka Şoreşa Rojava û heyanî niha tevgera ciwanan guhartin û veguhartinên cidî dan pêşxistin û wiha domand: “Di Şoreşa Rojava de roleke sereke ya ciwan û jinên ciwan hebû. Ciwan û jinên ciwan di tavahî qadên civakî û leşkerî de xwe bi rêxistin kirin. Her wiha ev şoreş ji bo me bû wesîleya ku em xwe nasbikin, erk û misyona li ser mile me çiye û em çawa li gorî pêvajo û rastiya xwe tevbigerin, hat nasîn. Bi qasî ku zihniyeta malbat, civak û dewletê li ser ciwanan bandor kiribû, me nedizanî hêz û enerjiya me heyanî kîjan astê ye. Ew hêza ciwanan ya herikbar hatibû xetimandin. Dewletê bi polîtîkeyên herî zirav siyaseta xwe bi taybet li ser ciwanan dida meşandin. Ji lewra ew hêza veşartî ya ku ciwan dikarin pêşengtiyê ji civakê re bikin ne pêkan bû. Ji ber vê de şoreşa Rojava de rêxistina ciwanan guhartinên cidî di aliyê hişmendî û kesayet de dan avakirin. Di van rastiyan de xwe kurkirin bû sedem ku ciwan bi rihekî fedayîtî nêz pêvajoyê bibin û bigihînin asta şehadetê. Bî guman ev bû bingeh ku ciwan bi hêz û zanebûna xwe pêşengtiyê bikin û di astên herî bilin de cih bigirin”.

**`Şoreşa 19 ê Tîrmehê mîrasê Berxwedaniya zindana ye`**

Zînê de destpêkê de azî ziman ku şoreşa 19 ê Tîrmehê yek ji mîraseyên berxwedaniya 14 ê Tîrmehê û wiha got: “Li ser xeta berxwedaniya ku di zîndanan de hatiye pêşxistin, Şoreşa Rojava îlhama xwe ji berxwedaniya 14 ê Tîrmehê wergirtiye, berxwedaniya ku di zîndana Amedê de hatiye raberkirin bû bingeh ji berdewamkirina tekoşîna Tevgera Azadiyê yê ku bi baweriya xwe ji dozê re bûye mênak ji tavahî tevgerên şoreşger yên cîhanê re. Şoreşa 19’ê Tîrmehê yek ji wan mîrasa ye, bi îdeolojiya Rêber Abdullah Ocalan ya demokrasî û azadiya gelan hat destpêkirin û gelek destkeftî bidest xist. “

**`Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo navenda xebatê me ye`**

Zînê anî ziman ku ji bo misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo me seferberî da ye îlankirin û wiha domand: “Dijminê faşîst bi girtina Rêber Apo xwest îradeya tevgera Apoyî bide rûxandin. Lê bi girtina Rêbertî re asta tekoşîna gel û tevgera Azadiyê zêdetir û mezintir bû. Îdeolojî û felsefeya Rêbertî xistin meryetê û li ser wê bingehê tekoşîn tê domandin. Bi girankirina tecrîda li Îmraliyê di şexsê Rêber Apo de careke din dijmin dixwaze tavahiya gelê Kurd bixe nava tecrîdê, herwiha dixwaze destkeftiyên gel yên heyî werin tepisandin. Lê belê ev yek di roja îro de ne pêkan e û êdî gel li hember tavahî cureyên êrîşan têkoşînê dike. Weke Tevgera Ciwanên Şoreşger jî me ev soz daya heyanî ku azadiya fîzîkî ya Rêbertî misoger nebe wê rihetî nîn be. Li ser vî esasî bi hemleya “Cenga azadiyê bi ser bixe Rêber APO azad bike” me seferberî li tavahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê da îlankirin. Tavahî xebatên ku em didin meşandin yekemîn ji bo misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rbertî ye. Bê guman gelek hemleyên din jî hatin destpêkirin, her wiha çalakiyên berfireh jî hatin lidar xistin. Ji destpêka şoreşê ve tavahî çalakî û xebatên ku dihatin kirin di serî de ji bo Rêber Apo bûn.”

**`Li hember polîtîkeyên dijim divê ciwan bên perwer dekirin`**

Zînê anî ziman ku dijim li hember ciwan û jinên ciwan siyaseteke taybet dide meşandin û wiha domand: “Dijmin li hember gelê kurd siyasetên qirkirin û asîmîlasyonê dide meşandin. Ji bo Kurdan ji hole rabike bi tavahî cureyên teknîka pêşketî êrîşî Gerîla û gel dike. Bi salane vê yekê dide meşandin, lê ji ber ku dijmin nagihêje tu encaman dest bi polîtîkeyên helandina cewherî kiriye. Li car perçeyên Kurdistanê dijmin polîtîkeyên gelek zirav li ser ciwanan orgenîze dike. Bi xetên şerê taybet yên ku mirov hêdî hêdî ji cewherê wî dûr dixîne bi awayekî giran û zane dide meşandin. Ji ber vê armancê ew e ku civaka Kurd bi demê re bê helandin, ew jî tenê bi riya nifşên pêşerojê tê pêkanîn. Lewra bi meşandina polîtîkeyên zirav asîmîlekirina ciwan û jin armanc dike. Bi taybet di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dijmin valakirina herêmê ji ciwanan armanc dike û ji bo wê tavahî derfetan dide vekirin. Bi riya xapandina ciwanan her wiha teşwîqkirina ciwanan bi derketina ji welat, xetên zirav yên şerê taybet dide meşandin. Her wiha bi belavkirina madeyên hişbir di nava ciwanan de, rê li ber zehmetiyên gelek mezin vedike. Li hember van polîtîkeyan tevgera ciwana û jinên ciwan di nava lêgerîn û xebatên mezin de ne. Her wiha bi riya perwerdekirina ciwanan em dixwazin tavahî jin û ciwanan şiyar bikin da ku ji siyaseta dijmin re nebin qurbanî.”

**`Prastina nirxên şoreşê erka me ye`**



Zînê di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku bi silogana “Bi rihê Apoyî xwe nû bike, canga azadiyê ser bixe” ewê şoreşê biparêzin û wiha got:”Di pêvajoya pêşiya me de erk û berpirsyartiya me girantire. Ji bo ciwanan û jinên ciwan divê ked û xebatekî daha zêdetir û berfirehtir ku em xwe bigihînin tavahî ciwanên Sûriyê bê meşandin. Li hember pêvajoyê û ji bo parastina nirxên Şoreşa Rojava, bi silogana ciwana ya “Bi rihê Apoyî xwe nû bike û cenga azadiyê ser bixe” em soza xwe ji bo tavahê gelê Kurd û Şehîdan nû dikin.”

## BÊBEXTIYA LOZANÊ



**Hafiz Ahmet Turhalli**

Sed sal di ser peymana Lozanê re derbas bû. Êş û azarên kurdan û kêmenetewan kûrtir û girantir bûne. Bêbextiyek navdewletî û rûreşiyek giran li serê me kurdan bitaybetî û niştecihên Kurdistanê bi giştî hate kirin. Sed sal berê ji hêla desthelatên cîhanê ve, kurd û Kurdistanî ji fermiyeta dewletên dunyayê hatin durxistin. Gelekî xwedan rabûrduyeke 15 hezar salî, bizanebûn û plankê ji fermiyeta sîstema nû ya cîhanî hate dûrxistin. Ev biryara navdewletî biryara tunekirina erdnîgariyek ku, derguşa mirovahiyê di hemêza xweda lorandibû. Pirtûkên pîroz jî behsa vê xakê dikin. Tewrat dibêje Bihuşt û Quràn jî jê re dibêje xaka pîroz. Bi vê peymana zaliman, hem xaka welatê me hate perçekirin û hem jî tunekirina gelê Kurd, bi biryarekî navdewletî hate erêkirin. Bi rêberiya Mistoyê kor û Ismetê kehr, serdemekî nû di erdnigariya me de hate destpêkirin. Cîhana dewletan çarenûsa gelê me, dan destê Tirk, Ereb û Farisên nîjadperest. Ev desthelatperestên herêmî jî, Ji bo desthelata xwe, qirkirina cîranên xwe yên bi hezarê salan yên Kurd, dan pêşiya xwe û dest bi qirkirinê kirin. Welatekî bi 10 hezaran sal navê wê heye û gelekî resen di dîroka mirovahîyê de xwedan rol û mîsyone, ji bo rakirina wan ji holê, ev peyman hate pêşxistin. Bi vê peymanê di serî de derguşa Olan, Mezheban û bihevre jiyanê hate hilweşandin. Qaşo navê vê peymanêjî, peymana aşitiyêye. Lê vê peymanê, ji bilî xwînrejandinê, malwêraniyê û tunekirinê tu çareserîkî bi xwe re neanî.

Bi peymana Lozanê re şerê tunekirina kurdan dest pê kir. Dijî van qirkirinan, serhildan û berxwedan jî pêşketin. Berzencî, Şêx Seîd, Seyîd Riza, Ihsan Nurî paşa, Qadî Mihemed û bi 10’an serhildan çêbun. Tenê kurdan li çar perçeyên Kurdistanê zêdetirî milyonekî şehîd dan. Dagirkerên Kurdistanê jî û bi piştgirtina dewletên cîhanî jî bi ser neketin. Ji bo têkbirina kurdan wan jî bi 100 hezaran leşker wendahî dan, bi tirliyonan pere dan, lê rexmî hemû hevkariyan jî ew bi ser neketin.

Îsal di Lozanê de kurdan mohra xwe li dîrokê dan. Ji hemû perçeyên Kurdistanê, ji hemû Olên Kurdistanê, ji hemû lehceyên kurdan, Asurî/suryani, Ermenî jî di vê konferansêde amade bûn.

Piştî sed salî kurdan û Kurdistaniyan bang li hemû cîhanê kirin û gotin bi peymanên we em naqedin û hûn nikarin me tune bikin.

Zêdetirî 600 delgeyên ku ji nûnerên çar perçeyên Kurdistanê pêk dihat amade bûn. Di heman rojên konferansê de meşeke mezin ya Kurdistaniyan jî pêkhat. Divê were zanîn rexmî hemû piştgirtinên navdewletî jî, peymana Lozanê bi ser neket, berovajî wê têk çû. Di Konferansê de axeftvanan bi yek dengî, gotin ‘Ne Kurd ne jî KurdIstan namirin’. Wek di Marşa me ya neteweyî de hatiye gotin: “Kes nebê Kurd dimire, Kurd jîn dibe”.

Serokê Şaredariya Lozanê jî tevlî Konferansê bû û peyamên sererastkirina Lozanê dan.

Dijminên kurdan, raste we Kurd parçe kirin; lê tekoşîna kurdan ya yekitî û serkeftinê neha mezintire.

kurdan rexmî hemû kêmasiyên xwe, îtifaqa xwe bi giranî ava kirine. Kurdan bi tekoşîna xwe peymana Lozanê dirandin û avêtin ser sergoyê. Neha dem hatiye ku kurd û Kurdistanî bê kêmasî bigihêjin hemû mafên xwe.

Divê ew desthelatên ku Kurdistan perçe kirin vê rastiyê bibînin û bi daxuyaniyan xwe ji peymana Lozanê paşve bikşînin. Di serî de Ingilistan û Fransa wiha bikin û karibin gunehên xwe daweşînin.



# ‘PDK hevkarê rawakirina Dagirkeriyê ye’

PDK’ê di xizmeta berjewendiyên dewleta Tirk a dagirker de ti sînoran nas nake û di dijminatiya li dijî Kurdan de jî bûye hevkarê dijminê gelê xwe. Endamê Meclisa Giştî ya PYD’ê Eseed Menan diyar kir ku careke din bi temsîlkirina xeta xiyanetê, PDK û dûvikê wê ENKS’ê di bin navê alîkariyên mirovî de saziyên xwe li Efrînê vedikin û armanca wan ya sereke jî rewakirin dagirkeriyê ye.

**Zana Roj/ Şehba**

Ji roja dagirkirina Efrînê de dagirkeriya Tirkiyê û komên çeteyan tavahî sûcên dijmirovî û derveyî exlaq li ser gel didin meşandin. Kiryarên dagirkeriyê; ji guhartina demografîk, kuştin, revandin, tecawîzkirin, talankirin, qutkirina dar û daristanan bê navber dewam dikin. Bi guhartina nasname, bikaranîna pereyên Tirkiyê û vekirina saziyên xwe, herwiha ferzkirina zimanê Tirkî di perwerdeyê li dibistan û zanîngehan de, dewleta Tirk dagirker hewil dide ku guhertina demografîk bi lez pêk bîne. Da van demêm dawiyê de di bi navê alîkariyên mirovî, PDK’ê û ENKS’ê navendên saziyên xwe didin vekirin. Ew bi vekirina saziyên xwe di hundir Efrênê de hewil didin ku dagirkeriyê rewa bikin.

Derbarê vekirina navendên saziyên ENKS û PDK’ê di Efrînê de, her wiha berdewamkirina xeta xiyanetê ya ku bi 10’ê salan ji aliyê PDK’ê ve tê meşandin, endamê Meclisa Giştî ya PYD’ê Eseed Menan ji rojnameya me re axivî.

**‘Xeta xiyanetê berdewame’**



Eseed bal kişand ser plan û êrîşên li dijî kurdan tên meşandin û wiha got: “Beriya peymana Lozanê bi 3 salan peymana SÎVR hatibû organize kirin, di wir de hin mefên Kurdan hatin diyarkirin ku Kurd dikarin statûya xwe bistînin û bibin xwedê dewlet. Di sala 1923’an de peymana Lozanê hat îmzekirin. Di nava vê peymanê de biryarên SÎVR ya ji bo Kurdan bi pilaneke di navbera hêzên navnetewî û Tirkiyê de hat guhartin. Di dîrokê de divê em ji bîr nekin vê yekê ku yî nûnertiya Tirkiyê di Lozanê de kir Kurd bû ; Asmat Enûnû bû. Di Lozanê de got “Em dewletê naxwazin û em û Tirkan birane, em dikarin bi hev re jiyan bikin”. Di vir de tê diyarkirin ku Kurdên xiyanet temsîl kirine û hêştin ku mafê gelekî bê tunekirin û Kurdistaneke ser bixwe neyê avakirin, her hebûn. Ji bo berjewendiyên kesayetî a niha em bedel didin. Û ev yek heyanî vê rojê jî her berdewam e. Di roja îro de li dijî gelê Kurd PDK’ê hevkarê yekemîn yê dagirkeriya tirkiyê ye “.

**`Dîrok û pilanên sedsalî guhartin`**

Eseed anî ziman ku gelê kurd li her çar perçeyên Kurdistanê di qirkirineke etnîkî û çandî re derbas bûn û wiha domand: “Di nava van pilanan de Kurdistan hat perçekirin û siyaseta qirkirinê hat destpêkirin. Gelê kurd bû qurbanê van peymanan. Di bin navê netewdewlet de kurd di fermanan re derbas bû, gundên kurdan hatin şewtandin, kurd bê biryar hiştin û di çar perçeyan de di nava qirkirineke etnîkî û çandî re derbas bûn. Ev hemû jêdara xwe ji planên navnetewî, pêşketina xeta xiyanetê û berjewendiyên kesayetî werdigre. Dema niha jî gelê kurd di sedsala 21 mîn de bi îdeolojî û têkoşîna Rêber Abdullah Ocalan dîrokê diguherîne û planên sedsalî hildiweşîne”.

**`Di Efrînê de rengê Kurdan tune dike`**

Eseed diyar kir ku dewleta Tirk û komên çeteyan bi dagirkirina Efrînê re xwestin armancên xwe yên dîrokî pêk bînê û wiha domand: “Dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girydayî wê ,di Efrînê de tavahî rê û rêbazên helandinê pêk tînin. Ji bo guhartina demografiya Efrînê, gelên Ereb li wir bi cih dike, malên mêtîngeriyê ava dike, her wiha bi navê Turkmenan partiyan ava dike. Bi kiryarên xwe yên li ser gelê resen êdî rengê Kurdan tune dike, kuştin, revandin, dizî, destavêtin û talankirina mal û milkên gel bênavber didomîne . Bi van polîtîkeyan Tirkiyê dixwaze bighêje armancên xwe yên dîrokî; ku wekî Lîwaa Iskenderona li Efrîn jî bikin”.

**`PDK bi vekirina navendên xwe dagirkeriyê rawa dike`**

Eseed anî ziman ku ENKS’ê dagirkirina Efrînê weke rizgarkirinê pênase dike û saziyên xwe ava dike û wiha got: “Dagirkirina Efrînê ji bo partiyên Kurd yên xayîn weke ENKS ê, tê wateya rizgarkirinê. ENKS’e yê ku bi destê PDK’ê tê birêvebirin, dagirkeriya Efrînê rawa dibîne. Tevî ku hemû kiryarên dijmirovî jî li pêşiya çavên wan dihatin kirin. Di van demên dawiyê de, di bin navê saziyên xêrxwaziyê yên Berezanî de, navendên xwe di hundir Efrênê de vedikin. Her wiha banga gelên Efrînê yên Koçber bûne dikin ku vegerin Efrînê. Careke din di xeta xiyanetê de dimeşin û bi dijmnê Kurdan re dibin yek. Vekirina van navendan wekî ku dagirkirina Efrînê rewa dibînin.”

**`Ji bo têkbirina dagirkeriyê hevgirtin pêwîste`**

Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiya Demokrat Eseed Menan di dawiya axaftina xwe diyar kir ku ger em li hember dijmin nebin yek emê nikaribin Kurdistaneke azad avabikin û wiha got: “Planên ku di dîrokê de ji bo tunekirina Kurdan hatine pilankirin, divê werin hilweşandin. Her wiha xiyaneta ku dihate kirin, divê were derbaskirin. Pêwîste hevgirtinek di mijara rizgarkirina axa Kurdistanê ji dijmin bê avakirin.”

# 11 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin

**HPG’ê ragehand ku di çalakiyên gerîla de 11 leşkerên Tirk ên dagirker hatin cezakirin û 3 dagirker jî birîndar bûn, herwiha kamereyeke mobesse û konek hatin îmhakirin û derb li konekî hate xistin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê derbarê çalakiyên li dijî dagirkeriyê daxuyaniyek da.

HPG’ê da zanîn ku hêzên wan yên li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî çalakiyên xwe didomînin û artêşa Tirk a dagirker derbeyên giran dixwe û wiha dewam kir: “Di çalakiyên hêzên me de ku bi cesaret û biryardariyeke mezin didomînin, 11 dagirker hatin cezakirin û 3 dagirker jî birîndar bûn. Sîstemeke kameraya mobesse û konek hatin îmhakirin û derb li konekî hate xistin .Di 28’ê Tîrmehê di saet 06.40’an de dema ku li dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî ketin nava tevgerê, bi çekên giran li wan hate xistin û dagirkerek hate cezakirin. Di 28’ê Tîrmehê di saet 07.30’an de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî li konekî dagirkeran û sîstemeke kameraya mobesse hate xistin. Sîstema kameraya mobesseyê hate îmhakirin û li kon hate xistin. Ev çalakî ji aliyê hêzên me yên YJA Starê ve hat lidarxistin. Di 28’ê Tîrmehê di saet 12.00’an de li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî bi çekên nîv otomatîk li çeperê dagirkeran hate xistin û 2 dagirkerên di hundirê çeper de hatin cezakirin. Di 28’ê Tîrmehê di saet 13.10’an de bi çekên giran li konên dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî hate xistin. Ev kon hate îmhakirin û 2 dagirkerên di hundir de hatin cezakirin Di 28’ê Tîrmehê di saet 13.30’an de dema ku dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî ketin nava tevgerê bi çekên giran li wan hate xistin û dagirkerek hate cezakirin.



Ev çalakî ji aliyê hêzên me yên YJA Starê ve hate lidarxistin. Di 28’ê Tîrmehê di saet 15.30’an de dema ku dagirkerên li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî ketin nava tevgerê, bi çekên giran li wan hate xistin û 2 dagirker hatin cezakirin. Di heman wextî de bi taktîka sûîqestê li dagirkeran hate xistin û dagirkerek din jî hate cezakirin. Ev çalakî ji aliyê hêzên me yên YJA Starê ve hate lidarxistin.

Di 28’ê Tîrmehê ji saet 19.10’an heta 19.20’an li dagirkerên ku li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî diketin nava tevgerê û hewl didan bi cih bibin, hate xistin û 3 dagirker hatin cezakirin. Di 29’ê Tîrmehê ji saet 01.10’an heta 02.30’an li Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî helîkopterek kete nava tevgerê. 2 caran bi çekên giran mudaxeleyî van helîkopteran hate kirin.”

**Êrîşên artêşa Tirk a dagirker**

HPG’ê da xuyakirin ku di 27 û 28’ê Tîrmehê de qada Golka ya Metînayê carekê, qadên Gundê Girê, Gundê Sêdarê û Gundê Seravê yê herêma Garê 4 caran; bi giştî 5 caran bi balafirên şer hatin bombekirin. Herwiha da zanîn ku Herêmên Zap, Rojavayê Zapê ya Şehîd Delîl û Metînayê bi dehan car bi topan hatin bombekirin.

Navenda Ragehandin û Çapemeniya HPG’ê daxuyaniya xwe wiha qedand: “PDK’ê têkildarî mirina Mihemed Mîrze ku roja 23’ê Tîrmehê ew bûyer qewimî bû, daxuyaniyek da û Tevgera me berpirsyar nîşan da. Weke HPG’ê ti eleqeya me bi bûyerek wisa re tune ye. Li gel ku ti belgeyek piştrast kirî li holê nîne, hewl tê dayîn vê bûyerê bi Tevgera me ve bidin girêdan û ev rewş bi zanabûn tê kirin.”

# Xwedîderketina li şoreşê

**Cîger Efrîn**

Hesab pirsîn bi derketina dewletê re derket û heta dewlet û ferasetên dewletê hebin wê bêmafî hebe. Bêguman hesab karekî ku mêjî-aqil dixwaze.Angu bi aqil derxistina tiştan ji nav hev,peydakirina kêmahî û zêdebûnan bi aqil tê kirin.

Pirs ;karê mêjî-aqil yê herî kevnar û aqilê mirov bi pirsê bûye ber bi kamîlbûnê ve diçe. Çi guhartin di kes an jî civakê de çêbûne (baş an nebaş)hema hemû di encama pirsên di hişê mirov de qewimîne rûdane. Pirs, ji meraqa zanînê derketî. Mirovên pirsên hêja û kûr dipirsin wek feylesofan derketine. Serdestan herî pir êrîşî hêza pirsînê di mirov de kirî û dike û mirov bi jiyana rojane ve girê didin.Wek e, Rêbertiyê gotî;“ yên bi jiyana rojane ve hatibin girêdan kole ne!“. Li cihê ku pirsîn tunebe li wir ne zanebûneke rast heye,ne jî azadî heye;li wir koledar û kole heye.

Pirskirin;lêgerîn e,destpêka têkoşîna ramanî ye û di heman demê de raberkirina vînê ye! Ji lewra kesê/a ku napirse û li bersiva xwe nagere ew kole ye û di kolebûnê de rik kirine!

Mirovên ku dipirsin û têkoşîna gihandina bersiveke rast dimeşînîn,azad dibin û xwedî li keda xwe derdikevin in! Yên bi tenê dipirsin û têkoşîna beralîkirina mij û perdeyên ku bersiva rastîn nixumandî nakin,kole ne, ji xwe re axayan mezin dikin û mafê wan ê gazinan jî tune ye!.

Ji alîyekî ve hesab pirsîn rexneye, xwestina rastkirina şaştiyê, li keda xwe xwedî derketine û israra di azadbûna rihê xwe de ye.

Gava em jiyana Rêber Apo lêkolîn bikin,em ê bi awayekî vekirî bibînin ku, hemû jiyana Rêbertî hesab pirsîn e! Herî dawî bi pêşxistina paradîgma Modernîteya Demokratîk hesab hema ji her tiştî pirsî. Ji xwe felsefa Rêbertiyê;“tişta heyî nebaş e, ya baş gengaz e(mûmkine)“. Ev,gotina Rêbertiyê,pir zelal raberkirina hesab pirsîna ji her tiştа heyî ye.


Yên hesab napirsin bi tenê gazincan dikin. Gazinckirin,karê kesê/a lewaz,kesê/a di xwe de vîna têkoşînê nabîne û tirsonek e! karê kesên ku li keda xwe xwedî dernakevin.Karê kesê/a rihetiya xwe xera nake.

Gazinckirin mirov biçûk dike. Mixabin îro li Rojava hinekî gazinckirin bi pêşketi ye.

Di serî de vê bêjin;gazinckirin qet nelayîqî kesekî/ê ye û divê tu kesek layîqî xwe jî nebîne. Her wiha divê em layîqî hevûd jî nebînin û gava em rastî yekî/e wiha hatin,bi rexneyên xwe em jê re bibin alîkar ku zûtir ew xwe ji qirêjiya dewletê xelas bike.

Niha em her tiştî ji kîsê xwe fêrbûn/fêrdibin;Di Kurdistanê de şerê gerîla nehatibû kirin.Bi tenê Sîtav Îhsan Nûrî Paşa ceribandibû,lê derbarê wê heyamê de zêde dokuman tunebûn. Lewra şerê gerîla pêşengên me ji kîsê xwe fêr bûn,niha jî li Rojava em karê rêvebirinê ji kîsê xwe fêrdibin! Tu bixwazî nexwazî şaşîtî,kêmasî çêdibin,derdikevin.

Divê em baş bizanibin ku şoreş ne malê Kadro ye,ne yê rêveberan e! Kî dibe bila bibe kî li şoreşê û nirxên hatine afirandin xwedî derkeve,şoreş ya wan e!




Rêber Apo û şehîdan şoreşek diyarî me kir! Li me maye ku em şoreşê biparêzin. Parastin,bi bilindkirin û zêdekirina nirxan mûmkîn dibe.

Nihaşoreşa me derbasî duzdeh saliya xwe bû. Ev e,heger em wek gel bi awayekî rast û li gorî rastiya Rêbertiyê li hember şaştiyan derkevin û hesab bipirsin,wê rêveberî li gorî feraseta Rêber Apo were sererastkirin. Gelek rêbazên hesab pirsînê hene. Di komîn û meclisan de, di civînên bi gel re têne lidarxistin,bi nivîsandina raporan û hwd.Her wiha bi pêşxistina daxwaznameyên gilîkirinê jî hesab pirsîn mûmkin dibe. Heta ku encam were girtin,divê em hesab pirsînê bidomînin. Lê em carekê dibêjin û dev jê berdidin. Û piştre dest bi gazincan dikin.

Divê em bizanibin ku heta em wek gel nebin hêzeke hesab pirsînê,rêveber (kî dibe bila bibe) xwe rast nake. Lê gava em wek gel timî hesab bipirsin wê kesên rêvebir mecbûr bibin ku xwe sererast bikin.

Wekî mînak;tê gotin“filan kes diziyê dike,filan kes xwe li ser nirxan dide jiyan kirin.“ Temam,em hemû gotinên têne gotin bêjin rastin,me di civînên komînê de jî anî ziman lê guhartinek çênebû. Wê demê divê em herin daxwaznameyên gilîkirinê li saziyên peywendar pêşkêş bikin. Gava bi dehan daxwaznameyên gilîkirinê bi pêşket,wê hesab were pirsîn û yên rêvebir jî wê bizanibin ku hêzeke hesab pirsînê heye û wê li gorî rastiya şoreşê tevbigerin. Lê na,“bila partî were rast bike,bila Qandîl mûdaxele bike“Halbûkî bi van gotinan em partî û Qandîl dikin hedef ji hêzên emperyal û dagirkeran re.Me beriya 25 salan bi wê ferasetê Rêbertî kir hedef,niha jî em nekevin heman şaşitiyê.

Bi taybetî jî malbatên me yên welatparêzên kevin û malbatên şehîdan, divê em bizanibin ku şoreş ne ya partiyê ye,şoreşa gel e! Partî pêşengtî kir,berdêlên giran dane ku, gel bi hemû pêkhateyên xwe li ser axeke azad xwe bi rêve bibe.Karê partiyê nîşandina xeta rast e û zanekirina gel e .Partiyê ev kir.Bêguman rista partiyê neqediye. Lê partî îro heye sibê tune ye. Încax gel wê her hebe. Ji lewra divê em wekî xwediyên şoreşê li ked,xwîn û xwêdana xwe xwedî derkevin.Timî şopdarên xeta Rêbertiyê bin.“Şaşitî hene,dizî heye,kesên dervayî axlaqê Rêbertiyê jiyan dikin hene,kesên zordariyê dikin,wekî rêjîma dewletê nêzî gel dibin,neheqiyan dikin hene“, wê demê bi rexneyan nebû em ê herin daxwaznameyên gilîkirinê pêşkêş bikin û şopdarê daxwaznameyên xwe bin. Em her dibêjin;“bijî Rêber Apo“,bi tenê bi vê gotinê Rêbertî najî! Jiyankirina Rêbertiyê bi jiyankirina pergala Netewa Demokratîk,Xweseriya Demokratîk e! Bi rûniştandin û jiyankirina felsefa “JIN JIYAN AZADÎ“ gengaz dibe.Pêdiviya Rêbertiyê bi pesndayînê tune ye,pêdiviya wî bi jiyankirina ramanên wî yên bi kedeke bêhempa bi pêşxistî û hemû temenê xwe di oxira wan de daye,heye!

Gava em wekî pêkhateyên heremê bi hesab pirsîna ji kesên dervayî axlaqê civaka demokratîk dijîn û timî li şoreşê xwedî derkevin,wê demê em ê Rêbertiyê bidin jînkirin û em ê layîqî şehîdan bin! Di serî de jî wê jiyana me xweşiktir û ewlementirbe.

Îro hemû hêzên dewletparêz li dijî şoreşa Rojava ne û bi awayekî dixwazin şoreşê têk bibin. Gava me wekî gel û hemû pêkhateyên heremê ji hundir ve rê nedin ku qirêjiyên dewletê di nava me de bijîn û me her hundirê mala xwe paqij girt,wê hemû êrîşên derva bê bandor bibin. Em ê layîqî Rêbertiyê,Tevgera Azadiyê,Şehîdên nemir û rastiya gelê şoreşger bin.


Îro kî dixwaze barê gerîla,hevalên di çiyayên azad de li ber xwe didin sivik bike,dewleta dagirker têk bibe û Rêber Apo di nava gelan de bibîne,divê hesab bipirse.Dervayî feraseta Partiyê nehêlibin kesek(kî dibe bila bibe)xwe li ser xwîna şehîdan,keda Rêbertiyê,cangoriya gerîla û xwêdana gel xwe bide jiyan kirin.

Ked mirov azad dike,lê gava mirov hesab bipirse û xwedî li keda xwe derkeve,xwedî li nirxên civakî derkeve, mirov azad dibe.Wekî din hemû gilî û gazinc valane û xizmetî dijberên şoreşê dikin.

Kesê/a ku şaşitiyan dibîne û heta şaşitî ji holê ranebe tênekoşe,tenê li her derê gilî û gazincên xwe tîne ziman,ew,bi wê kiryara xwe xizmetî her tiştî dike,bi tenê xizmetî şoreşê nake.

Demokrasî riya jiyana xweseriya Demokratîk e! Hesab pirsîn jî gava herî bingehîn a demokratîkbûna kes e.Kesê/a ku hesab nepirse ne demokrat e û dev ji hemû mafên xwe berdaye. Divê em wekî kes,gel û hemû pêkhateyên heremê kêliyekê zûtir li mafên xwe xwedî derkevin,beriya ku zeman derbas bibe.

---



## LOZAN û Hilwestên li himber

**Ahmet Aktaş**

Ji bo salvegera 100’an a Peymana Lozanê, îsal li wî cihê ku ev peymana qirker û xiyanetkar lê hatibû vajokirin/îmzekirin, hilwestên gelek hêja yên bi ruhê tolhildêr hatin dîtin. Ev cara yekê ye ku ewqas bi hijmara berbiçav, ku nêzî 20 hezar kesî li wir civiyan, meşiyan, mitîng û konferans çêkirin.

Dibe ku were gotin ‘pir caran zêdeyî 100 hezar kes jî civiyane, meşiyane û miting çêkirine’. Rast e, lê belê vê carê gelek aliyên wê yên cudatir û giringtir hene.

Hema yek; cara ewil e ku di vê astê de ji çar parçeyên Kurdistanê û ji çar aliyên cîhanê Kurdistanî, li ser mijarekê, lê ne wisa mijarek ji rêzê, belê li dijî mijarek dîrokî ya di asta navdewletî de biryara tunekirina gelên Kurdistanê hatibû standin û hatibû îmze kirin, girseya gel kom bûye.

Du; vê carê, ne hema bi tenê li ser astek hestiyarî û acizbûnê ya sererû re, belê him gelên Kurdistanî û him dostên gelên Kurdistanî, yên li wê erdê sûc li dijî gelên Kurdistanê hatibû kirin, hemûyan bi yek dengî û bi heman cewherî yên zanistî dijberiyên xwe yên hevpar qirîyan.

Yek ji nîşanên vê gotinê;

Sisê; Konferansek bi beşdariya 600 delegeyan hat organizekirin û 2 rojan dewam kir. Di vê Konferansê de biryarên hêja yên zanist û hesappirs hat in standin.

Çar; ev biryarên ku bi yekdengî hatin standin, li ber deriyê wî xaniyê ku ew biryarên tunekirina gelê Kurd û hemû gelên Kurdistanê hatibûn standin, bi girseya gel re, bi dengê bilind ji raya giştî cîhanê re hat e pêşkêş kirin.

Erê, bêgûman van hilwest û çalakiyên li dijî vê Peymana Lozanê ya mirina gelên Kurdistanê, gelek bi rûmet in, tije hêvî, bawerî û curet in. Lê divê were zanîn ku vana bi tinê, têrî ew armancên pîroz ên wê Konferansê û daxwazên gelên Kurdistanê nakin.

Lewma, ji bo ku van biryaran bikeve jiyanê/pratişîkê, divê li gorî wan, organizasyon were çêkirin; komîte, komisyon, ofis were vekirin û hwd. Pêşeng û xebatkarên van hewldanên hêja, wê hêviyê û baweriyê didin ku ew ê, vê xebata hêja bi ser bixin.

Belê di salvegera vê mijara neyînî ya dîrokî de, du hilwest gelek balê dikişîne, yek; a dewleta Tirka, du; ya Malbata Berzanî!

Bi taybetî bêdengmana Erdogan balkêş e. Ji ber ku heta nuha hema li himber her çalakiyên wisa, bi zimanê lewitî êrîş dikir, lê vê carê hêjî bêdenge.

Dibe ku Erdogan, dît wê ti berhemê bi dest nexe û îca berovajî Tevgêra Azadiyê sûd werbigre. Lewma bêdeng ma.

Ji xwe ji bo bêdengiya Malbata Berzanî, pêdivî bi şîroveyê jî nîne, ji ber ku êdî bûye parçeyek jî siyaseta Erdogan û hemû ferman û planan ji wir distîne û dide meşandin. Ma ne diyar e; gelê me li Ewrupayê, gerîlla li welat, ji bo pêşî li êrîşên dewleta tirk bigre, berxwedanek qehremane dimeşîne, lê Nêçîr û Mesrûr jî, milê xwe dane fermandarê xwe Erdogan û bi hev re dujminkariya gelê Kurdistanê dikin.

Temenê xiyanetê dirêj nakişîne!

---



# Veguherîna siyaseta Tirkiyayê û bandoriyên wê

**Navenda Rojava ya lêkolînên stratejîk**

Di hevkêşeya navdewletî de, nemaze di alozîyên navdewletî yên mezin mîna alozîya Ukraynayê, pevçûna Rûsî-Rojavayî û alozîya Sûriyayê de, Tirkiya xwedî giranîyeke jeopolîtîk e û tu kes, nemaze dewletên mezin nikarin çavê xwe ji vê yekê bigirin. Li ser vê bingehê, Erdogan hemû dewletan keysbaz dike da ku qaseyeke mezin a destkeftîyan ji dewletên rojavayî û Rûsiyayê di heman demê de, bi dest bixe. Rûsiya ji ber ku di şerê wê bi dewletên rojavayî re, pêdivîya wê bi Tirkiyayê heye, hinek tiştan bi dest wê ve berdide û çavekî xwe li ber siyaseta Tirkiyayê ya li dijî Rûsiyayê digire, herwiha bihaneyan jî jê re dibîne; ku Rûsiya fişarên dewletên rojavayî yên li ser Tirkiyayê ku piştî pênc fermandarên rêxistina “Azrov” a terorîst (Nazîyên nû) anîn Kiyêvê, fêm dike. Ew jî da ku Tirkiyayê bîne bi alîyê xwe de; an jî herî kêm wê di şerê rojavayî-rûsî de, bêalî bihêle. Lê belê, dewletên rojavayî jî, ji ber ku Tirkiya endameke NATO’yê ye, fişarê lê dikin da ku siyaseta wê ya sepandina sizayan li ser Rûsiyayê, bi cih bîne û divê ku pabendîyê bi biryarên wê bike. Bi tevî van fişarên dewletên rojavayî yên li ser Tirkiyayê jî, lê belê dewletên rojavayî nikarin Tirkiyayê neçarî vê yekê bikin; çi ku ditirsin Tirkiya xwe li Rûsiyayê bigire û Rûsiya vê yekê ji bo xwe bi kar bîne û Tirkiyayê bêtir bîne nava meydana xwe. Lê di heman demê de, hesabê rewşa aborîya Tirkiyayê ya jihevketî dike ku dê Tirkiya di demeke nêzîk de, neçarî bicihanîna biryarên dewletên rojavayî bibe. Ev yek ji me re dide diyarkirin ku gengaz e Tirkiya mercên xwe yên ji bo tevlîbûna Siwêdê bo NATO’yê bi rêya daxwazkirina bo tevlîbûna di nava Yekîtîya Ewropayê de, vekişîne. Çi ku Tirkiya, ji bo ku rewşa xwe ya aborî baş bike, pêdivîya wê bi dewletên rojavayî heye.

Bi tevî ku Erdogan gelek destkeftî ji şerê rojavayî-rûsî yê li Ukraynayê û ji alozîya Sûriyayê bi dest xistine jî, lê belê piştî serkeftina wî di hilbijartinên serokkomarîya Tirkiyayê de, Erdogan kete quncikeke teng. Nemaze piştî ku nikarî lîreya tirkiyayî ku daketiye astên herî ketî li beramber dolar, ji hilweşînê xilas bike, her wiha binkeftina wî di standina glopa kesk ji bo êrîşkirina li ser herêmên Rêveberîya Xweser a bakur û rojhilatê Sûriyayê û nikarîbûna wî ji bo guhartina peymana Lozanê ya ku sed sal di ser re derbas bûn û Erdogan her demê bang dikir ku dê di bendên wê de, li gor çavnebarîyên osmanî sererastkirinan çêbike. Ji ber ku ev serdem a dawî ye ji bo serokatîya Erdogan li ser desthilata Tirkiyayê û ji bo misogerkirina xwe û malbata xwe, her wiha ji tirsa çêbûna buhara tirkî li dijî rêjîma wî û piştî ku di encama siyaseta xwe ya derveyîn de bi bin ket û ji ber çavnebarîyên wî yên ku li dijî berjewendîyên dewletên rojavayî li Rojhilata Navîn û pergala cîhanî, Erdogan hewl dide ku têkilîyên xwe bi dewletên rojavayî re baş bike. Ev xwenêzkkirina Erdogan ber bi dewletên rojavayî ve, dê bi xwe re bihêle ku Erdogan hin tiştan ji dest bide û dê neçar be ku siyaseta dewletên rojavayî bi sepandina sizayan li ser Rûsiyayê, di demeke nêzîk de bipejirîne. Li beramberî wê jî dê têkilîyên tirkî-rûsî hilweşin û dê wê çaxê Rûsiya nema bikare ku bihaneyan ji Tirkiyayê re deyne; çi ku dê Tirkiya di tewereya dewletên rojavayî de be. Di encamê de dê Rûsiya ji bo kişandina Tirkiyayê ber bi xwe ve bi bin bikeve û di heman demê de, dê Erdogan di siyaseta xwe ya şantajkirina her du alîyan ji bo bidestxistina destkeftîyan de, bigihêje dawîyê.

Dê têkilîya Erdogan bi dewletên rojavayî û Rûsiyayê re, di dema nêzîk de, çawa be?

Li sr asta dewletên rojvaî

Siyaseta Erdogan hişt ku têkilîya wê bi dewletên rojavayî re hilweşe, taybet piştî ku berê xwe da dewletên rojhilatî “Çîn û Rûsiya”. Êdî aniha hewl dide ku têkilîya xwe bi dewletên rojavayî re sererast bike. Di vê dema dawîyê de bi rêya dergeha Ukraynayê xwe nêzîkî dewletên rojavayî dike û li gor wê jî, wê rê da ku pênc fermandarên rêxistina Azrov (Nazîyên nû) ku Rûsiya şerê wê dike (Paqijkirina Ukraynayê ji nazîyên nû), derbasî Ukraynayê bibin. Her wiha dê tevlîbûna Siwêdê bo NATO’yê bi rêya daxwazkirina bo tevlîbûna nava Yekîtîya Ewropayê wek mercekî tevlîbûna Siwêdê nava NATO’yê, erê bike. Diyar e ku piştî serkeftina wî di hilbijartinên serokkomarîya Tirkiyayê de, hinek hesabên Erdogan ên cuda hene; ew jî girêdayî rewşa aborî û ya hundirîn (Buhara Tirkî) û rewşa ewlekarîyê ya malbata wî ne.

Diyar e ku dewletên rojavayî nema bawerîyê bi Erdogan tînin. Jixwe têkikîyên dewletên rojavayî bi Tirkiyayê re, ji gava ku Erdogan hatiye li ser desthilatê, dest pê bûne. Li gor wê jî, palementoya Tirkiyayê rê neda hêzên Amerîkayê ku xaka wê ji bo lêdana rêjîma Sedam Hisên bi kar bîne, piştre jî pergala S400 ji Rûsiyayê kirî, her wiha geşbûna têkilîyên tirkî-rûsî, hemahengîya zêde ya di navbera wan di alozîya Sûriya û Ukraynayê de û çavnebarîyên Tirkiyayê yên ji bo dagirkirina hin parçeyan ji Sûriya û Iraqê (Mîsaqa Millî) ku nakeve xizmeta dewletên rojavayî de, hemû jî hiştin ku têkilîyên dewletên rojavayî bi Erdogan re hilweşin; çi ku Tirkiya hewl dide bi rêya çavnebarîyên xwe yên berfirehbûnê, wek hêzeke mezin derkeve pêş. Lê belê dewletên rojavayî rê nadin Tirkiyayê ku wek hêzeke cîhanî derkeve pêş (Vegera Osmanîyê bi teşeyê xwe yê nû) û li gor wê jî dê dewletên rojavayî, her çi qasî Tirkiya vegere dawa wê jî,




dê gelek tiştan pêşkêşî wê nekin. Dê alîkarîyên dewletên rojavayî ji Tikriyayê re, begihêjin asta ku wê ji alozîya wê ya aborî dernexin; çi ku dê bi awayekî lezgîn û li beramberî mercan be. Her wiha dê hilweşîna lîreya tirki û aborîya wê bidome. Bi tevî ku Erdogan hesabên dewletên rojavayî yên nû dizane jî, lê belê ew neçar e xwe bigihîne dewletên rojavayî. Her wiha hîn jî xwedan kaxezin li gor dilê dewletên rojavayî ye; ku dikare bi rêya wan hin destkeftîyan bi dest bixe û nemaze li ser asta kesayetî; ku nehêle buhara tirkî rabe û ewlekarîya malbata xwe bi dest bixe. Jixwe ev yeka han dê Tirkiya di dema pêş de bi Rûsiyayê re bixe nava alozîyekê.

Li ser asta rûsiyayê

B tevî ku siyaseta Rûsiyayê heya niha di bêalîkirina Tirkiyayê di alozîya Ukraynayê de û di gelek dosyayan de ew bi xwe ve girê daye, her wiha di alozîya Sûriyayê de gelek sûd jê girtiye jî, lê belê dawîya siyaseta Rûsiyayê binkeftin e. Çi ku Tirkiya ji alîyê dewletên rojavayî ve hatiye çêkirin û bandoreke wê ya mezin di alîyê leşkerî û aborî de li ser heye, her wiha piranîya derbeyên leşkerî yên ku çêbûne, bi rêya tora Gladyoyê ku destê wê yê dirêj e, pêk hatine. Ev yek gava em bi desthilatên Rûsiyayê re berawer dikin, em dibînin ku desthilatên Rûsiyayê li ser wê nîvtune ne.

Bi tevî ku di van salên dawîyê de têkilîyên wan xurt bûne jî, lê belê ev nayê wê wateyê ku Rûsiya dikare bandorê li ser siyaseta Tirkiyayê bike; çi ku ew hêza wê tune ye ku Tirkiyayê ji alozîya wê ya aborî derxîne, nemaze hevdemî şerê bi Ukrayna û dewletên rojavayî re. Encex bi rêya projeyên aborî yên hevpar ev yek pêk were, lê belê ev jî demeke dirêj dixwaze heyanî ku Tirkiya berhemên wê bi dest bixîne. Jixwe ev yek nakeve xizmeta Erdogan; çi ku pêdivîya wî bi çareserîyên bilez heye û encex ev bi destê dewletên rojavayî pêk were.

Vegera Tirkiyayê bo himbêza dewletên rojavayî, tê wateyê hilweşîna têkilîyên bi Rûsiyayê re. Êdî bihaneyên ku Moskoyê ji biryarên Enqerayê yên li dijî wê datinîn, nema didomin û gava Erdogan bi hêvîya başkirina aborîya Tirkiyayê bike- ve himbêza dewletên rojavayî, dê bigihêje asta qutbûnê. Dê ev qutbûn bandorê li alozîya Sûriyayê jî bike û dê ev yek aloztir bibe, gava ku Rûsiya ji ber çûyîna Erdogan ber bi dewletên rojavayî ve (Bi hevkarîya li gel hêzên rêjîmê û milîsên îranî) dest bi cenga Idlibê û bakurê Sûriyayê ya rizgarkirina wan ji rêxistinên terorîst bike. Ne dûr e, ku hevkarî di navbera Rûsiya û Hêzên Sûriyaya Demokratîk de jî wek bertekeke li hember vê nêzîkbûnê, ji bo şerê li dij terorê, hevkarî çêbibe.

Lê belê Rûsiya bi her awayî hewl dide ku nehêle rewş bigihêje vê astê, çi ku şerê wê bi dewletên rojavayî re demdirêj e û dê vekirina enîyeke nû li pêşberî wê nekeve xizmeta wê û encamên wê li ser Rûsiyayê ziyandar bin. Lewre jî hewl dide bi rêya pêkanîna têkilîyan di navbera Enqera û Şamê de, Tirkiyayê bikişîne ber bi xwe ve.

Di vê rewşê de, rewşa Tirkiyayê ji ya Rûsiyayê ne baştir e; çi ku dewletên rojavayî hewl didin ku Tirkiyayê bikişînin şerekî bi Rûsiyayê re; her çi qasî neyekser be jî. Dê ev yek ji alîyekî ve hêza leşkerî û aborî ya Rûsiyayê kêm bike û wek hêzeke cîhanî ya mezin ji meydanê dûr bixe, ji alîyê din ve jî dê nehêle ku Tirkiya bibe hêzeke mezin. Di heman demê de, dê derbeyekê li têkilîyên rûsî-tirkî bide û nakokîyên dîrokî di navbera wan de ku di seranserî dîrokê de xizmeta dewletên rojavayî kirine, ji nû ve vejîne.

Di vê çarçoveyê de û bi tevî siyaseta pragmatîk a ku Erdogan dimeşîne jî, lê belê çûyîna Erdogan ber bi dewletên rojavayî ve, dide diyarkirin ku çi qasî tevlîhev e û nikare di navbera têkilîyên xwe yên bi rojava û rojhilat re û alozîya aborî ku dê bandorê li rewşa hundirîn jî bike, hevsengîyê çêbike. Ji bo ku xwe ji çêbûna hin alozîyin nû dûr bixe, hin guhertinên ji kokê ve pêk anîn û hin kesayetên nû di wezaretên xwedan deshtilat de erkdar kirin; ev jî bi hêvîya ku çareyekê ji hilweşîna aborîyê re bibîne, aloziyên nû çênebin û têkilîyan ji nû ve bi dewletên rojavayî re deyne. Dibe ku Erdogan di siyaeta xwe ya pragmatîk de hîn jî her du alîyên şerker şantaj bike, lê belê dê ev siyaset dom neke û di demeke nêzîk de bi awayekî neyînî bandorê li Tirkiyê bike.

---

FENER



## Ji Derziya Dijmin Pirtir Şûjina Xwe Bibînin!

**Idrîs Henan**

Piştî civîna welatên NATO`yê û taybet helwestên bi nêzîkatiyên faşîzma Tirk re derketine, diyar dibe ku rejîma li Tirkiyê zivirîneke siyasî ya ber bi çav jiyan dike. Daxuyaniyên aliyên pêwendîdar ên navneteweyî yên piştî zelalbûna helwesta Tirkiyê ji Siwêd, Ukranya û Rûsyayê re, baş destnîşan dikin ka berê siyaseta faşîst a Tirk ber bi ku ve çûye.

Êrîşên bi çekên kîmyewî û nûklerî, taybet piştî civîna lûtkeya NATO`yê, paralelî sedsaliya Lozanê, êrêşên li ser hev ên bi balefirên bê mirov li ser Başûr û Rojavayê Kurdistanê, eşkere dikin ku hegemonî li ber itîfaqeke nû ya fena Lozanê ye ku dixwaze careke din narvîna gelê Kurd di nava dagirkerên Kurdistanê de berbelav û qir bike. Weke sedsala derbasbûyî ku bi qirkirina Ermenan tacîdar bûye, vê sedsalê jî dixwazin Kurdan bi derbekê ji holê rakin û tune bikin. Ji bona vê yekê jî dewleta Tirk a faşîst erkdar bûye, him ji aliyê NATO û him ji aliyê Yekîtiya Ewropayê ve weke nobedarê qirkirina gelan li herêmê hatiye ser kar. Lew re; ji nû ve bûye desthilatdar û celebên mîkanîzmayên qirkirin û îmhakirinê lê zêdekirin.

Eger îro faşîzma Tirk û tevayî dagirkerên Kurdistanê têkoşîna gelê Kurd qir dikin, ew hêza xwe ji îmakanên NATO û Yekîtiya Ewropayê digirin. Piştgiriyeke perjewendîperest e ku ti pîvanên mirovayiyê nas nake. Lew re jî; çi destwerdanên li îradeya gelan hatiye kirin, bê deng mane û di paş perdeyan de perspektîva cînosîdê didin.

Tişta pêwîste were fêmkirin ku di rastiya cînosîda em qalê dikin de, qirkirina çandî navend e. Bê guman nikarin tevayî Kurdistanê û Kurdan aliyê fîzîkî ve tune bikin, lê dikarin bi qirkirina çandî re civakê hilweşînin. Eger êrişeke leşkerî karibe çend kesan bi yek derbê bikuje, qirkirina çandî dikare bi yek derbê bi milyonan mirov ji nav bibe. Rengê wê yê herî xirab jî oto-qirkirina çandî, otoasîmîlasyon e.

Îroj faşîzma Tirk dixwaze bi van îmkanên teknelojî û mekanîzmeyên ezmûna DYE û YE qirkirina Kurdan temam bike û muhra xwe li bin peymaneke nû ya Lozanê bixe. Divê em şûjina xwe bi qasî derziya xelkê jî bibînin! Eger faşîzm zemîna qirkirinê li ser pişta NATO û YE ava dike, beşa mezin a avakeran jî dijminê hundirîn e. Lew re pîwste em ji berê hestiyartir bin, taybet pêşengên civakê rewşenbîr, hunermend, nivîskar û akademisyen ku rola mezin a berxwedana li hemberî qirkirina çandî li ser pişta wan e. Divê bi xemsarî, sadebûn û seranseriya xwe em nebin hevkarên qirkirina li serê Kurdan tê maşendin. Ji stranekê heya fêrbûna tîpeke zimanê Kurdî were, divê hemû li ser bingeha parastina hebûna razber û şênber a gelê Kurd be.

Ji ber vê jî kongreya 4 rojan a li ber avahiya Peymana Lozanê hatiye lidarxistin, ew lihevkirina Tirk û NATO`yê ya qirkirinê Kurd vala derxist û îradeya azadiyê tivî kir. Lew re; îroj li çiyayên Kurdistanê darbên herî giran li dagirkeriya Tirk a bi hişmendiya Lozanê hatiye strandin dikevin û hemû hewldanên profakatîf ên têkbirina projeyên demokrasiyê yên bi pêşengiya Kurd, ji nav hatin birin. Îro jî hêza komploger a Lozanê li ber gelekî rêxistinkirî xwedî raman û felsefeya jiyan nû ye ku hemû dunyayê dihewîne nava xwe. Lew re, vîna bi vê paradîgmayê hatiye afirandin, ji vir û pê ve jî, nikare were tunekirin. Xwedîderketina Kurd li çanda xwe û parastina nirxên bi şoreşê re hatine nûjenkirin, erkekî bingehîn ê Kurdan e. Çi parvekirin û lihevkirinek nû li dunyayê nikare bê vîna Kurd bijî.